

Kêş di Stranên Dîlankî yên Kurmancî de Destxetên Mela Xelefê Bafî Weke Nimûne¹

Kurte

Stran cureyeke ji helbesta gelêrî ya herî berbelav e ku bi melodiyeke tê strîn. Ev helbestên ku dahênerê wan nediyar e, di her dem û warên jiyana gel de cih girtine û ketine nav zimanê gel. Li her deverê bi navekî hatibe binavkirin lê zêdetir navê *stran* hatiye pejirandin. Stran, beşek e ji helbesta folklorî ye û bi naverok û şêwaza xwe ji cureyên folklorî yên din vediqete. Divê naverok û şêwaza wan baş bêne dahurandin ku him şikl û forma wan a resen xirab nebe û him wate û fonksiyona wan berdewam bike.

Ev xebat li ser beşeke şêwazê ye ku li ser kêşa stranên dîlankî yên Kurmancî radiweste. Ji ber ku stran cureyek helbesta folklorî ya kêşdar e, bi taybetî xebat li ser helbestên folklorî yên kêşdar e. Ji stranên jî stranên dîlankî yên ku di lîstikên dawet û govendên Kurmancan de tê strîn, bi nêrîneke helbestane dadihûrîne û kêşên wê yên sereke tesbît dike. Cureya kêşa van stranên, hejmara wan a rîtmî, hejmara wan a birgeyî/kîteyî û rêjeya wan bi mînakên derdixe holê. Mînakên xebatê ji stranên destxetên Mela Xelefê Bafî hatine wergirtin ku wî di navbera salên 1982-1986 berhev kirine.

Bêjeyên Sereke: Edebiyata Kurdî ya Devkî, Stranên Kurdî ya Gelêrî, Stranên Dîlankî, Kêş, Mela Xelefê Bafî.

Kürtçe Halay Şarkılarında Ölçü (Mela Xelefê Bafî'nin El Yazmalarından Örneklerle)

Özet

Kürt halk şiirinin en yaygın türlerinden biri olan halay şarkıları, Kürt halk şiirinin bir melodi eşliğinde söylendiği türüdür. Söyleyeni belli olmayan bu şiirler, hayatın birçok alanında ve anında halkın dilinde yer edinmiştir. Her yörede farklı bir adla adlandırılrsa da halk arasında *stran* adı daha çok kullanılmıştır. Şarkı diyebileceğimiz bu şiirler, halk şiirinin bir türü olup gerek içeriğiyle gerekse üslubuyla diğer halk edebiyatı türlerinden ayrılmıştır. Kendine özgü bir şekli olan şarkı türünün, iyice anlaşılması ve toplumdaki fonksiyonunu tam bir şekilde yerine getirmesi için içerik ve üslup açısından ayrıntılı bir şekilde incelenmesi gerekir. Bir üslûpbilim çalışması diyebileceğimiz bu çalışmada, özellikle düğün ve oyun havalarda söylenen şarkılardan olan halay şarkılarının hece ölçüsü üzerinde durulmuştur. Şarkı, ölçülü olarak söylenen halk şiiri türü olduğundan, bu çalışmada ölçülü halk şiirleri örneklerine yer verilmiştir. Şarkı türü olarak da Kürtlerin oyun ve düğünlerde söylediği halay şarkıları ele alınmış olup bu şarkıların, Kürt Halk Edebiyatı'nda hangi ölçülerle kullanıldığı ortaya konmuştur. Bu çalışma yapılırken, 1993 yılında vefat eden Mela Xelefê Bafî adlı şahsın 1982-1986 yılları arasında Botan Bölgesi'nden derlediği şarkılardan yararlanılmıştır. Bu çalışmayla Kürt halk şiirinde geniş bir yer tutan halay şarkılarının ölçü birimi, ritim ve durak sayıları tesbit edilmiştir.

¹ * Ev gotar ji teza xwendevan ya Şêwaza Stranên Kurmancî -Destxetên Mela Xelefê Bafî Weke Nimûne- hatiye hîlbijartin.



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2024 • Cilt/Volume: 10 • Sayı/Issue:19

Muhammed İkbâl DENİZ

Xwendekarê Doktorayê
Zanîngeha Bîngolê
Ziman û Edebiyata Kurdî
mid Deniz@bingol.edu.tr
Orcid: 0000-0001-2345-6789

Hemin Omar AHMAD

Dr. Öğr. Üyesi
Zanîngeha Bîngolê
Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî
heminahmad40@gmail.com
Orcid: 0000-0003-1985-9512

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 03.01.2024

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 25.03.2024

Makale Yayın Tarihi / Published: 28.06.2024

DOI: 10.56491/buydd.1414307

Atf / Citation:

DENİZ, M. İ. û AHMAD, H. O. (2024). Kêş di Stranên Dîlankî yên Kurmancî de (Weke Nimûne: Ji Devera Botan Destxetên Mela Xelefê Bafî. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 10(19), 32-53

Anahtar Kelimeler: Sözlü Kürt Edebiyatı, Kürt Halk Şarkıları, Halay Şarkıları, Ölçü, Mela Xelefê Bafî.

Measure In Kurdish Halay Songs (With Examples from the Manuscripts of Mullah Khalaf Bafî)

Summary

Halay songs, one of the most common types of Kurdish folk poetry, is a type of Kurdish folk poetry sung to a melody. These poems, whose singer is unknown, have found a place in the language of the people in many areas and moments of life. Although they are called by a different name in each region, the name *stran* is more commonly used among the people. These poems, which we can call songs, are a type of folk poetry and are distinguished from other types of folk literature with both their content and style. The song genre, which has its own unique form, needs to be analyzed in detail in terms of content and style in order to be well understood and to fully fulfill its function in society. In this study, which we can call a stylistics study, the syllabic meter of halay songs, which are among the songs sung especially at weddings and games, is emphasized. Since song is a type of folk poetry sung in meter, this study includes examples of folk poetry in meter. As a type of song, the halay songs sung by Kurds at games and weddings are discussed, and the meters in which these songs are used in Kurdish Folk Literature are revealed. While conducting this study, the songs collected by Mela Xelefê Bafî, who died in 1993, from the Botan Region between 1982 and 1986 were utilized. With this study, the meter, rhythm and number of stops of halay songs, which have a large place in Kurdish folk poetry, were determined.

Keywords: Kurdish Oral Literature, Kurdish Folk Songs, Halay Songs, Measure, Mela Xelefê Bafî.

Destpêk

Stran wekî beşeke herî berbelav, zindî û berfîreh di nava çanda Kurdî de cihê xwe girtiye. Hestên lîrik ên gel, di nav xwe de hewandiye û ji mirin û windabûnê parastiye. Carina bi hestên xweş carina bi hestên nexweş rewşa gelê Kurd aniye zimên. Ev cure gelek caran bi kilaman re hatiye bilêvkirin û weke kilam jî hatine binavkirin; lê di rastiyê de di navbera wan de hin cudahî hene. Divê ev yek bi hin teknîkên lêkolînê ji hev bêne veqetandin. Yek ji van teknîkan jî teknîka şêwazê ye ku li rojava weke “stylistic” û li rojhilat weke “sebk” tê binavkirin. Di edebiyata Kurdî de jî ev têgih weke şêwaznasî û şêwazgerî tê bi nav kirin. Bi vê teknîkê em ê bikaribin stran û cureyên dinê yên wek heyran, lawik û kilaman bi hêsanî ji hev cuda bikin.

Stran weke berhemeke edebî li ser sê stûnên sereke: asta zimanî, asta rîtmî û asta xeyalî hatiye ava kirin. Bi rêya peyvên, awazek li ser tê danîn û bi rîtmêke ciwan tê strandin. Em ji vê cure helbesta gelêrê re dibêjin helbesta strankî. Mebest ji helbesta folklorî, strana folklorî ye. Kamil Hesen Besîr dibêje ku: şî’r beşeke ji goran e; lewra di herduyan de jî wezn, qafîye û dengên taybet hene.² Wate ji wê derbirîna hest û sozên di nav ax û derûniya mirovî de hatiye hebûnê û bûye beşeke ji jiyana gelê Kurd ku ew xwediyê gencîneyeke gelek dewlemend e. Di strana folklorî de hemû cureya mijaran heye. Ji evîne heta mirin û şîne û jî çanda civakî heta folklorî gel hemû reng û çêja kurdewariyê bi guhdaran dide bihîstin. Têkiliya muzîk û strana Kurdî ewqas xurt bûye ku stran weke navnîşana kurdewariyê hatiye dîtin. Her ji berê ve ev taybetmendî hebûye û dewlemendî û resenya xwe parastiye.

Kurtejiyan û Berhemên Mela Xelefê Bafî

Mela Xelef di 1ê Çileyê sala 1940î de li gundê Bafê ji dayik bûye. Navê bavê wî Remezan e û ji eşîra Harûnan e. Gundê Bafê dikeve rojavayê çemê Dicleyê û 35 km dûrî Cizîrê ye. Mela Xelef li Cizîrê û der û dora wê û li Botanê ilmên dînî xwendiyê. Ebdurreqîb Yûsîfê Zivingî³ dibêje ku yek ji wan dersdaran jî bavê min Mela

² Besîr, Kamil Hesen, *Mêjûy Rexnesazî*, Çapa 1em Weş. Taran, Silêmanî 2015 r. 500

³ Ebdurreqîb Yûsîfê Zivingî, bi eslê xwe ji Cizîrê ye û demek şûnde çûye aliyê Musilê û li wan deran mezin bûye. Nivîskar, dîrokan û şûnwarnasekî Kurd e. Û gelek keresteyên folklorî tomar kiriye. Carina jî ji xelkê daxwaz kiriye carina jî xelkê weke diyarî ji wî re şandiyê. Bi taybetî xebatên wî yên li ser cih û waran û li ser avahîsaziya Kurdî gelek berbelav e. Agahiyên cih û warên ku dîtine bi nivîsê qeyd kiriye. Xeynî van li ser edebiyata Kurdî ya Klasîk jî lêkolînên wî hene. Yek ji wana, *Dîwana Kurmancî* ye ku li ser jiyana şairên Kurd ên navdar ên weke Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û hwd. e. Îro Ebdurreqîb Yûsîf, hêj li heyatê ye û

Yûsif bû. Mela Xelef li cem Hesenê Zivingî, Mela Ebdurrehmanê kurê Mela Ebdulkerîmê Xendekî dersa fiqha Îslamî xwendiyê. Hinek li cem Ebdurreqîb Yûsifê Zivingî jî xwendiyê. Piştî ku wî îmîfîhana ku ji aliyê wezaret an jî Daîreya Ewqaf a Tirkîyeyê ve hatiye kirin, derbas kir, ew bû melayekî fermî li gundê Stewrikê ku dikeve aliyê rojava yê bajarê Cizîrê. Piştî sala 1977an ji aliyê kurê Seyid Eliyê Findikî, Mela Ebdurrehman ve ku wê wextê miftiyê Cizîrê bû, ew di mizgefteke Cizîrê de weke mela wezîfedar kir. Heta wefata xwe li Cizîrê ma. Ebdurreqîb Yûsif dibêje ku: destê wî di hûnandina şîrê de jî hebû, û pir qesîdeyên wî hene, û nihîni jî xizmet bo Kurdan kiriye vala, û westan nedizani. Feqehê min mela Xelef îşkê gelek mezin kir di mideya deh salan de. Li ser daxwaziya Ebdurreqîb Yûsif diçe gundê Bêdarê⁴ da ku *Dîwana Axawokê Bêdarî* ji neviyên wî peyda bike. Lê ji ber sermayê li Xesxêrê nexweş dikeve û dizivire. Mela Xelef di 31ê Gulana sala 1993an de li Cizîrê wefat dike.

Berhemên Wî

Name

Mela Xelef ji sêdî zêdetir name yê li ser edebiyat û folkora Kurdî nivîsiye û ji Ebdurreqîb Yûsifî re şandiye. Di van nameyan de derbarê gelek helbestên kilasîk ên windayî de agahî hene.

53 Defterên/Destxetên Muxtelîf

Ev xebata Mela xelef ji 5391 rûpelan pêk tê.⁵ Di van defteran çî keresteyên folklorî yê wek serpehatî, nukte, sitran, çîrok, destan, gotinên pêşiyar, mamîk û hwd. ku ji devê çavkaniyên zindî yê wek hikayebêj, stranbêj û dengbêjan guhdar kiriye bêtir guhartin nivîsiye. 216 ji van defteran bi navê “Dîroka Mîrnişîniya Botan” jî hêla Dilawerê Zengî ve hatiye tîpguhaztin.

Keşkol

Di vê xebata Mela Xelef de gelek helbestê şairên kilasîk ên muxtelîf hene. Xeynî van xebatan Mela Xelef wek *Diwana Melayê Cizîrî*, helbestên Mela Mehmûdê Hoserî, Axayokê Bêdarî û gelek helbestên kilasîk îstînsax kiriye û ji Ebdurreqîb Yûsifî re şandiye. Mela Xelef bi xwe jî wek te’lîf gelek qesîde û helbest nivîsiye.⁶ Wek mînak di *Destxeta 42an* de destana Hesam Axa û Le’lîxan weke helbest nezimandiye û wê weke metneke şanoyê pêşniyaz kiriye. Serpehatiya Feqiyê Teyran bi helbestkî nivîsiye. Dîsa di *Destxeta 38an* de zêmar û mersiyeke dirêj û qesîdeyekê heye ku wî bixwe nivîsiye.

Weku em ji jiyana Mela Xelef jî têdigihêjin, ew di karê berhevkarîyê de û di keşifandina cih û warên kurdan de gelek bi eşq û şewq bûye. Çî keleh, qesr, bendav û asarên derdora Cizîrê hebûye ku hêj nehatiye keşifandin, wî keşif kiriye û qeyda wê girtiye. Piştî demekê Ebdurreqîb Yûsif jê re pêşniyaz dike ku keresteyên folklorî jî berhev bike. Ew bi defteran kereste berhev dike û ji Ebdurreqîb Yusif re bi postê dîşîne. Lê mixabin carina posteya Silêmanî ew pirtûk teslîm nakin. Ji wan defteran ya 1em û 39em û ji 44an heta 53an jî xuyaye ku qeyd kirine lê wî wîndabûne. Hersê defterên dawî ku bi hejmarên 56, 57 û 58an hatiye qeyd kirin ji hin têtîniyên Ebdurreqîb Yusif û çend wêneyên Mela Xelef pêk tê. Ebdurreqîb dema behsa naveroka kelepore dîke dibêje ku kelepore me 5391 rûpel e⁷ û tê de stran, metelok, serhatî, hikayetên mîrên Botan, jiyana stranbêjan û gelek mijarên dîtir hene.⁸

Ev xebata li ser stranên Mela Xelefê Bafî yê ji devera Botan tomar kiriye pêk tê. Mela Xelefê Bafî di navbera salên 1982 û 1986an de li deverê geriyaye û ji stranbêj û dengbêjên wî wextî gelek keresteyên folklorî guhdar

bi Kurdên başûr re roportajan dîke û wana li ser qanala xwe ya youtubê parvedike. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. <https://www.youtube.com/@abdulraqibbyosuf4957> (10.01.2024) Ebdurreqîb Yûsif hemû berhevkarî û berhemên xwe yê dîtir li ser malpera xwe ya dijîtal qeyd kiriye. Ji bo agahiyên zêdetir bnr. <https://abdulraqib.net/> (12.12.2023)

4 Ev gund di navbera Xesxêrê û Miksê de ye.

5 Ji bo agahiyên zêdetir bnr. *Destxeta 56an* r. 4f

6 Qemerî, Cewat, Kurtejiyana Xelef Remezanê Bafî, *Kovara Kelhaamed*, hej. 47 Zivistan 2020-21 r. 45

7 Ji bo agahiyên zêdetir bnr. *Destxeta 56an* r. 4

8 Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Zengî, Dilawer, *Dîroka Kelepore Mîrnişîniya Botan*, Beyrûd 2005 r. 12

kiriye û wan keresteyan di 47 defteran de weke destxet nivîsiye. Me hemû defteran qontrol kir û çî stran hebûn, latîfîze kir. Di dawiyê de em gihîştin 44 stranan. Me ew stran li gorî rêza defteran her yekî rêz kir. Çî stranên me jê îstifade kir, pêşî bi hejmara helbestê paşê jî bi hejmara rêzîkê da. Wek mînak: helbesta 4an û rêzîka 2yan (4/2). Her çî cureyên weke kilam û lawikan ku me jê îstifade kir jî bi navê destxetê û rûpela wan me nîşan da. Weke mînak: *Destxeta 32*, r.2. Di van defteran de xeynî stranan, destan, kilam, çîrok, mamik, gotinên pêşyan, agahiyên derbarê deverê û hwd. jî hene. Mela Xelef her defterê li ser navê Ebdulreqîb Yûsîfî dinivîse û weke name jê re dişîne. Îro li ser malpera dijîtal ya Ebdulreqîb Yûsîfî ev defter hene. Her defterek bi qasî sed rûpelan e.

Di bikaranîna mînakan de me jî 44 stranên dîlankî yê ji devera Botan yê ku ji aliyê Mela Xelefê Bafî ve hatine tomarkirin sûd wergirt. Ew wek destxet di arşîva Ebdulreqîb Yûsîfî de bûn. Sînore xebata me jî tenê ev stran in. Di vê xebatê de stran, wek helbesteke edebî ji aliyê kêşê ve hatiye vekolîn. Ji ber ku kêş him di xwendina helbestan û him di wateya wan de cihê girîng digire. Dema mirov hay ji kêş û rîtmê tune be dibe ku mirov helbesta stranê kêş û zêde bi lêv bike an rîtmê tê de pêk neyne. Di warê kêş û kêşesaziya helbesta folklorî an strana folklorî de çend heb xebat gihîşt li ber destê me. Yek ji van xebata Dastan Teha û ‘Ebdullah Hemû⁹ bû ku li ser kêşa strana dîlankî ya Behdînan bû. Ev xebat tenê li ser kêşa xwemalî ya di asta rîtmî de bû. Xebateke din a Mihemed Bekr¹⁰ bû ku li ser kêş û rîtmê şî’rî a Folklorî Kurdî bi giştî bû.

Li ser helbestên folklorî jî hêla kêşê ve hin xebatên wek me li jorê behs kir hebin jî, ew ne li ser hemû dever û hemû cureyan in. Bi taybetî jî li ser stranên Kurmancî ev xebat kêş in. Îca valahiyeke bi vî rengî jî bo vê arşîvê jî hebû, me jî bi vî xebatê bal kêşa li ser wê.

Kêş di Helbesta Folklorî de

1. Kêş

Kêş yek ji hêmanên sereke ên helbestê û perçeyê ji muzîka derveyî helbestê ye ku di avakirina muzîka derveyî helbestê de roleke wê ya taybet heye. Herwiha kêş, yek ji wan bingehên sereke ye ku helbest û pexşanê ji hev cuda dike. Bixwe xwediyê çarçoveyê zanistî ye û wek zagonekê çarçoveyê bo helbestê ava dike û wê jî ji hev belavbûnê diparêze. Di derbarê avabûna kêşê de Ezîz Gerdî dibêje ku kêş di her zimanekê de ji çarçoveya giştî ya awaza derveyî helbestê pêk tê.¹¹

Helbest ew derbirîne ye ku ji derûnî û axa helbestvan peyda dibe û ew hest bi rêya ziman derdikeve derve û di dilê kêş û serwayê de tê hebûnê. Ni’metullah Hamid, di pirtûka *Şêwazgerî* de amaje bi vî yekê kiriye ku kêşa helbestê di nav peywendiyên dengî de dirustkirina encamê û bikaranîna peyvan e ku ji peywendiyên delalî û rêzimanî nayê cudakirin ku ji vêga her neteweyek li dû taybetmendiya zimanê xwe cureyê kêşa taybet bi kar tîne.¹² Weke nimûne: di zimanê Înglîzî û Yewnanî de kêşa *eyembîk* û di zimanê Frensî de *elxandere* ye. Lê bi şêweyê giştî çar sîstemên cihanî hene: kêşa jimareyî, kêşa çonî, kêşa çendî, kêşa awazî. Piraniya rexnegirên Kurd wê çendê diyar dikin ku helbesta folklorî ya Kurdî li ser kêşa birgeyê hatiye danîn.¹³ Kîte bi şêweyê giştî roleke karîger di kêşa şî’rî de digire, anku awazekê bi alîkariya dengdêran û bi erka dabeşkirina peyvan re diyar dibe.

1.1. Kêş di Edebiyata Kurdî de

Helbesta Kurdî di hemû zaravayên zimanê Kurdî de ji berê heta niha bi du cure kêşan hatiye danîn; kêşa erûzî, kêşa xwemalî.

1.1.1. Kêşa Xwemalî

9 Teha Dastan, Hemu ‘Ebdullah, Kêş Di Strana Dîlankî Ya Devera Behdînan da, *Kovara Poyêtîka*, Hej. 1 Payiz 2022

10 Bekr Mihemed, *Kêş û Rêtmî Şî’rî Folklorî Kurdî*, Weş. Aras, hej. 294, Hewlêr, 2004

11 Gerdî Ezîz, *Kêşî Şî’rî Klasîkî Kurdî*, Çapxaney Wezaretî Roşnîbîrî, Hewlêr 1999 r. 73

12 Nihêlî Ni’metullah, *Şêwazgerî-Teorî û Praktîk-*, Weş. Sipîrêz, Hewlêr 2007 r.191

13 Teha Dastan, Hemu ‘Ebdullah, h.g., r.39

Ev cureya kêşe, wek kêşa jimareyî, birgeyî, sîlab û penceyî jî tê zanîn. Ji dubareya hejmareke diyarîkirî ya birgeyan ava dibin. Kêş, li gorî hejmara kêteyan û cihê rawestana kêteyan tê diyarkirin. Di kêşa jimareyî de Dilşad Elî dibêje ku em dikarin jimareya birgeyan bi qasî penceyên destan bijmêrin, bo me Kurdan jî ew kêş xwemalî ye.¹⁴

Helbestvanên Kurd berî hatina Îslamê her çi beyt û lawik û heyran û çi jî stran be, hemû cureyên folklorî bi kêşa xwemalî vehonandine. Hemû helbestvanên neteweyî û hemû helbestvanên diyalekta Goranî bi kêşa birgeyî anku kêteyî helbest nivîsîne. Ji xeynî “Seyd” ê Hewramî, ku hinek helbestên xwe bi kêşa erûzî nivîsandiyê. Cigerxwîn jî di kovara Hawarê, hejmar 22yan ya sala 1933an de¹⁵ hewl daye ku hinek destepeyvên nû bi kar bîne. Cigerxwîn bo “lete şê‘r” ê peyva “gav” û jî bo “birgê” yê jî peyva “movik” daniye û hewl daye ku navê taybet bo “kêş”an bi kar bîne.¹⁶ Ev agahî jî nîşan didin ku kêşa xwemalî anku kêşa birgeyî, kêşa netewî ya gelê Kurd e.

2. Helbesta Folklorî

2.1. Helbesta Folklorî ya Bêkêş

Ev cure helbesta folklorî ya Kurdî jî aliyê hejmara kêteya rêzan ve xwedî reseniyekê nîne. Li ser bingeha dubarekirina çend diyardeyên zimanî wekî brano, lê lê, lo lo û... hwd. e.¹⁷ Weke strana serbest jî tê binavkirin. Cureya helbestên folklorî ya bêkêş ku berbelav in lawik, kilam û payizok in.

Kilama Mihemed Ronî

De loy lo, loy lo

Loy lo, loy lo,

De loy lo, loy lo

Mihemed Ronî,

De loy lo Mihemed Ronî min ê çi digot û

Tu xeyidî,

De, giyayê mêrga li mino, Mihemedê min

Seridî,¹⁸

Lawik

De lo lo lawikooooo

De lo lo lawiko

Ezîzê li ber dilê mino

Minê digo vê sibê berî sed cara

Li min berîîî

De birekî siwarê mala babê min rebenê

Xudê hatin

Li xême binê beriyê

14 Elî Dilşad, *Binyatî Helbest Le Honrawey Kurdî da*, Weş. Renc, Silêmanî 1998 r. 136

15 Kovara *Hawar*, weş. Belkî hej. 22 çap 2 gulan 2012 r.367-369

16 Gerdî Ezîz, *Kêşnasî Kurdî*, Dezgay Çap Pexşî Narîn, Hewlêr 2014, r. 239

17 Teha Dastan, Hemu ‘Ebdullah, h.g., r. 40.

18 Bafî, Mela Xelef, *Destxeta 3*, r. 144

Li hogica Mehmed Elî

Li binê dara xatûniyê¹⁹

Peyizuk/payizok

Ey lê ji îro pêde peyiz e min nekiryê

Kar û barê çilê mihka vê kanûnê

De ezê ji serê bilindê oxilmê werbûme

Minê xwe avêtiye binya Dorebînê

De heta malê me li warê havînê bû

Te dey nekir...²⁰

2.2. Helbesta Folklorî ya Kêşdar

Ev helbest bi kêşeke diyar hatine honandin û lîrik in. Em ji van helbestên folklorî re bi gelemperî dibêjin stran. Ji van helbestan re stranên bikêşe jî tê gotin. Di edebiyata Kurdî ya devkî de di beşa nezmê de cûreya ku ji hemûyan dewlementir stran e. Peyva “stran”ê jî gotina “stirîn” ê tê. Stirîn jî bo gotinên bi rîtm û selîqe tene gotin.²¹ Stranên dîlan û govendan, goranî, narînk, serê zava, beyt, şeşbendî, stranên zarokan û hwd. jî bi vî awayî tene vehonandin.

Ji van cureyan beyt û goranî jî aliyê Kurdên Behdînan û Botan ve zêdetir tê bikaranîn. Kurdên Serhedê di dewsa têgiha beyt de “destan” û di dewsa têgiha goranî de jî “stran” bikartînin. Beyt zêdetir, lehengî û destankî ne ku bi awayekî serbixe an jî di nav lawik û kilaman de wek menzûm tene gotin. Her miletek têgiha beytê li gorî helbest û vegêranê xwe pênase kiriye. Heta carna di nav deverên Kurdan de jî pênaseyên ji hev cuda derketine meydanê. Divê mirov li helbestên folklorî ya gel binihêre û biryarekê bide. Di nav helbestên me de beytên du rêz jî henin çar rêz jî henin. Di edebiyata gelêrî ya Kurdî de beyt, ne di wateya malik a edebiyata klasîk de ye. Beytên Kurdan ên navdar: Bersisê Abid, Zembîlfiroş, Memê Alan û hwd.²² Di beytan de mijar zêdetir epîk bin jî lê mijarê evînî, mirin û hwd. jî henin. Çend mînak ji destxetên Bafî:

Beyt

Keçê digo mîrê mino hey jariko li min jaro

Xelk û alemê girtibûn ji bo xuh dostiko yaro²³

Serê Zava

Serê zavano li ‘Eliyo

Serê zavano

Serî bi şaşa gêlano

Xêlê te ji baqê gûlano

Zavakî nû o li ‘Eliyo

Zavakî nû o

Destmala ketî sitû o

19 Bafî, *Destxeta* 32, r. 2

20 Bafî, *Destxeta* 14, r. 54

21 Kaplan, Yaşar, Strana Kurdî (Kurmancî): Devera Hekarîyan Wekî Nimûne, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 1, Cilt 1, Sayı 2, Kasım 2015. r.159

22 Jahany Parviz, Çiftci Hasan, Beytên Kurdî: Memê Alan Wek Mînak, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* Yıl: 6, Cilt: 6 Sayı: 11, 2020/1, r.16

23 Bafî, *Destxeta* 20, r. 104

*Qurbankin dayk û xasû o*²⁴

3. Kêşa Xwemalî di Strana Dîlankî ya Devera Botan de

3.1. Kêş li Gorî Rîtmê

Strana dîlankî yek ji stranên şahî û semayê ye ku loma zêdetir li ber govend û reqsê tê gotin. Ji bo ku bikeve çokan û govendê bide reqisandin jî pêdivî bi kêş û pîvana dengî an wateyî heye. Ji ber vê yekê strana dîlankî, bi kêş û serwayê tene vehonandin.

Strana dîlankî li ser gelek kêşan hatiye danîn û bêhtir li ser 7 kîteyan diçe. Xeynî 7 kîteyan bi kîteyên 6, 8, 10, 11, 13,14 û 15an jî hatine vegotin.

3.1.1. Kêşa 6 Kîteyî bi Rîtma 3+3 Kîte

Xafiro ezo lê (3+3) 6

*Li hewlê biharê*²⁵

Tablo 1

1	2	3	4	5	6
<i>Xa</i>	<i>fî</i>	<i>ro</i>	<i>e</i>	<i>zo</i>	<i>lê</i>
<i>Li</i>	<i>hew</i>	<i>lê</i>	<i>bi</i>	<i>ha</i>	<i>rê</i>
rawestana wateyî			rawestana wateyî		

- Asta kêşê rast e: 6=6 kîte ye.
- Asta rîtmê: 2 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.
- Kêşa 6 kîteyî bi rîtma 3+3 kîteyan e.
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.²⁶

3.1.2. Kêşa 7 Kîteyî bi Rîtma 4+3 an 3+4 Kîte

Ev cure kêşa 7 kîteyî, siviktirîn kêşeya xwemalî ye. Bi rejejeke zêde, di strana kurmancî de hatiye bikaranîn. Bi rîtmên 4+3 an 3+4an hatiye honandin. Wek mînak:

Lo dîno, dîno dîno (3+4) 7

*Evdalo dîno zalo*²⁷

Tablo 2

1	2	3	4	5	6	7
<i>Lo</i>	<i>dî</i>	<i>no</i>	<i>dî</i>	<i>no</i>	<i>dî</i>	<i>no</i>
<i>Ev</i>	<i>da</i>	<i>lo</i>	<i>dî</i>	<i>no</i>	<i>za</i>	<i>lo</i>
rawestana wateyî			rawestana wateyî			

- Asta kêşeyê rast e: 7=7 kîte ye.
- Asta rîtmê: 2 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.

24 Bafî, 23/1-2

25 Bafî, 7/3

26 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=CeYeI5duQIU> (20.12.2023)

27 Bafî, 19/1

- Kêşa 7 kîteyî bi rîtma 4+3 an 3+4 kîteyan e.
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.²⁸

Stranên dinê ku bi vê kêşê ne:

Weyla dêlê dêrikê (4+3) 7

Weyla dêlê dêrikê²⁹

Cendirme hoy cendirme (4+3) 7

Xulam lawko cendirme³⁰

3.1.3. Kêşa 8 Kîteyî bi Rîtma 4+4 Kîte

Cureyeke dinê ya kêşa folklorê kurdî kêşa heşt kîteyî ye. Ev kêş ji kêşên herî diyar û xuya yê helbesta Kurdî ya hevçerx e û ji kêşên din zêdetir karîger e û ji kêşên din zêdetir karîger e.³¹ Weke mînak:

Sala heştê poşman ezo (4+4) 8

Wey gulê gulê gulê zar (4+4)8

Sala heştê poşman ezo

Çing çing çêdikim neqşê mîrzo³²

Tablo 3

1	2	3	4	5	6	7	8
<i>sa</i>	<i>la</i>	<i>heş</i>	<i>tê</i>	<i>poş</i>	<i>man</i>	<i>e</i>	<i>zo</i>
<i>wey</i>	<i>gu</i>	<i>lê</i>	<i>gu</i>	<i>lê</i>	<i>gu</i>	<i>lê</i>	<i>zar</i>
rawestana wateyî			rawestana wateyî				

- Asta kêşeyê rast e: 8=8 kîte ye.
- Asta rîtmê: 2 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.
- Kêşa 8 kîteyî bi rîtma 4+4 kîteyan e.
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.³³

3.1.4. Kêşa 9 Kîteyî bi Rîtma 6+3 Kîte

Ew stranên ku li ser kêşa neh kîteyan hatiye honandin gelek kêş in. Strana ku bi neh kîteyan hatibû vehonandin, ev e:

Rabin narîn bînin wey Narê (6+3) 9

Rabin,

Narîn bînin delalêêêê³⁴

Li ser kêmrêziya strana li jor du ihtimal hene: a yekem dibe ku rêzika duyem şikestiye, lê ev di helbestên folklorî de zêde xuya nake dibe ku weke sê rêzik derketibe holê:

28 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=IwNLt8cJWGA> (20.12.2023)

29 Bafî, 5/1

30 Bafî, 14/1

31 Elî Dîlşad, h.b., r. 139

32 Bafî, 4/3

33 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. https://www.youtube.com/watch?v=sEarjTH_mHo (20.12.2023)

34 Bafî, 32/19

Tablo 4

1	2	3	4	5	6	7	8	9
<i>Ra</i>	<i>bin</i>	<i>na</i>	<i>rîn</i>	<i>bî</i>	<i>nin</i>	<i>wey</i>	<i>Na</i>	<i>rê</i>
<i>Ra</i>	<i>bin</i>	<i>na</i>	<i>rîn</i>	<i>bî</i>	<i>nin</i>	<i>de</i>	<i>la</i>	<i>lê</i>
rawestan				rawestan				

A duyem kêteya dawîya rêzikên kê mî bi qasî rêzika tam dirêj hatiye strandin. Ev cure strîn heye.³⁵ Ji bo bikaranîna duyem tabloya dinê:

Tablo 5

1	2	3	4	5	6	7	8	9
<i>Ra</i>	<i>bin</i>	<i>na</i>	<i>rîn</i>	<i>bî</i>	<i>nin</i>	<i>wey</i>	<i>Na</i>	<i>rê</i>
<i>Ra</i>	<i>bî</i>	<i>i</i>	<i>i</i>	<i>i</i>	<i>i</i>	<i>i</i>	<i>i</i>	<i>n</i>
<i>Na</i>	<i>rîn</i>	<i>bî</i>	<i>nin</i>	<i>de</i>	<i>la</i>	<i>lê</i>	<i>ê</i>	<i>ê</i>
rawestan						rawestan		

- Asta kêşeyê rast e: 9=9 kête ye.
- Asta rîtmê: 2 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.
- Kêşa 9 kêteyî bi rîtmî 6+3 kêteyan e.

Strana *Narê*, her çiqas ji aliyê rîtmî şîrî ve bi rêk û pêk nexuyê jî, lê em dizanin ku di van cure stranên de carinan rêzikeke stranê dişkê û di rêzike dinê de berdewam dike. Êdî kêş û pîvana rîtmê, stranbêj bi dengê xwe eyar dike. Jixwe di helbesta gelêrî de wezn û qafiye ne ji bo çav e, ji bo guh e.

3.1.5. Kêşa 10 Kîteyî bi Rîtmî 7+3 an 5+5 û 6+4 Kîte

Ev kêşe di Kurmanciya naverast de zêdetir bi rîtmî 5+5 xwe bide nîşan jî lê mînakên bi rîtmî 7+3 û 6+4 jî henin.

Bûm qûma'l dorê çema yar yeman (7+3) 10

*Bûm qûma li dorê çema dost yeman*³⁶

Tablo 6

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
<i>Bûm</i>	<i>qû</i>	<i>ma'l</i>	<i>do</i>	<i>rê</i>	<i>çe</i>	<i>ma</i>	<i>yar</i>	<i>ye</i>	<i>man</i>
<i>Bûm</i>	<i>qû</i>	<i>ma'l</i>	<i>do</i>	<i>rê</i>	<i>çe</i>	<i>ma</i>	<i>dost</i>	<i>ye</i>	<i>man</i>
rawestana wateyî							rawestana wateyî		

- Asta kêşeyê rast e: 10=10 kête ye.
- Asta rîtmê: 2 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.
- Bilêvkirina li gorî kêteyê li ser înternetê hene.³⁷

Çend stranên din ên ku bi vê kêşê hatine vehonandin:

Lolo pismamo lolo pismamo, (5+5) 10

35 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. https://www.youtube.com/watch?v=oZ_alCuIX4k (25.12.2023)

36 Bafî, 6/3

37 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=mPL1sDuhyJE> û <https://www.youtube.com/watch?v=OmGX8KPlvWY> (25.12.2023)

*Lolo pismamo dotmam bi xulamo*³⁸

Mende mende mende hoy Mendê min, (6+4)10

*Mende mende mende lewendê min*³⁹

3.1.6. Kêşa 11 Kîteyî bi Rîtma 4+4+3 Kîte

Li serê rêka dighemê Meyremê (5+3+3) 11

Li serê rêka dighemê Zalimê

*Torînê qotiya derman û melhemê*⁴⁰

Tablo 7

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11
<i>Li</i>	<i>se</i>	<i>rê</i>	<i>rê</i>	<i>ka</i>	<i>dig</i>	<i>he</i>	<i>mê</i>	<i>Mey</i>	<i>re</i>	<i>mê</i>
<i>Li</i>	<i>se</i>	<i>rê</i>	<i>rê</i>	<i>ka</i>	<i>dig</i>	<i>he</i>	<i>mê</i>	<i>Za</i>	<i>li</i>	<i>mê</i>
<i>To</i>	<i>rî</i>	<i>nê</i>	<i>qot</i>	<i>ya</i>	<i>der</i>	<i>man</i>	<i>û</i>	<i>mel</i>	<i>he</i>	<i>mê</i>
rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî		

- Asta kêşeyê rast e: 11=11 kîte ye.
- Asta rîtmê: 3 rawestan di her nîvedêrekê de heye.
- Kêşa 11 kîteyî bi rîtma 5+3+3 kîteyan e.
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.⁴¹

3.1.7. Kêşa 13 Kîteyî bi Rîtma 4+4+5 Kîte

Huy çem e çem e Mehmed Beg Çemê Cizîrê wey (4+4+5)13

*Huy çem e çem e Têlî Beg Çemê Cizîrê wey*⁴²

Di strana li jorê de niveka rizikê şikestiyê û weke rêzeke nû xuya kiriye; lê di rastiyê de ev stran du rêzik in.

Tablo 8

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13
<i>Huy</i>	<i>çe</i>	<i>me</i>	<i>çe</i>	<i>me</i>	<i>Meh</i>	<i>med</i>	<i>Beg</i>	<i>Çe</i>	<i>mê</i>	<i>Ci</i>	<i>zî</i>	<i>rê</i>
<i>Huy</i>	<i>çe</i>	<i>me</i>	<i>çe</i>	<i>me</i>	<i>Tê</i>	<i>lî</i>	<i>Beg</i>	<i>Çe</i>	<i>mê</i>	<i>Ci</i>	<i>zî</i>	<i>rê</i>
rawestan				rawestan				rawestan				

- Asta kêşeyê rast e: 13=13 kîte ye.
- Asta rîtmê: 3 rawestan di her nîvedêrekê de hene.
- Kêşa 13 kîteyî bi rîtma 4+4+5 kîteyan e.
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.⁴³

3.1.8. Kêşa 14 Kîteyî bi Rîtma 4+3+4+3 an 3+4+3+4 Kîte

38 Bafî, 9/1

39 Bafî, 15/1

40 Bafî, 43/2

41 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=rhrHaodEOHg> (25.12.2023)

42 Bafî, 11/1

43 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=yu2WV-UavZM> (25.12.2023)

Hey nêrgiz nêrgiz nêrgiz nêrgizê narê cwanê (3+4+3+4) 14

Hey nêrgiz nêrgiz nêrgiz sorgulê bêrîvanê⁴⁴

Tablo 9

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14
Hey	nêr	giz	nêr	giz	nêr	giz	nêr	gi	zê	na	rê'c	wa	nê
Hey	nêr	giz	nêr	giz	nêr	giz	sor	gu	lê	bê	rî	va	nê
rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî	

- Asta kêşeyê rast e: 14=14 kîte ye.
- Asta rîtmê: 4 rawestana wateyî di her nîvedêrekê de heye.
- Kêşa 14 kîteyî bi rîtma 3+4+3+4 kîteyan e.
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.⁴⁵

Lê lê Kinê lê lê lê mala min ê wayi wey (4+3+4+3) 14

Lê lê Kinê lê lê ê mala min ê wayi wey⁴⁶

Tablo 10

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14
Lê	lê	ki	nê	lê	lê	lê	ma	la	mi	nê	wa	yi	wey
Lê	lê	ki	nê	lê	lê	lê	ma	la	mi	nê	wa	yi	wey
rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî	

- Asta kêşeyê rast e: 14=14 kîte ye.
- Asta rîtmê: 4 rawestana wateyî di her nîvedêrekê de heye.
- Kêşa 14 kîteyî bi rîtma 4+3+4+3 kîte ye
- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.⁴⁷

3.1.9. Kêşa 15 Kîteyî bi Rîtma (4+4+ 4+3) Kîte

Ez xelef im xelef im hawara mîr hawara mîr (4+3+4+4) 15

Ez xelef im xelef im 'Ezdînşêr hakimê Botan e

Tablo 11

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14	15
Ez	xe	lef	im	xe	lef	im	ha	wa	ra	mîr	ha	wa	ra	mîr
Ez	xe	lef	im	xe	lef	im	'Ez	dîn	şêr	ha'k	mê	Bo	ta	ne
rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî				rawestana wateyî		

- Asta kêşeyê rast e: 15=15 kîte ye.
- Asta rîtmê: 4 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.
- Kêşa 15 kîteyî bi rîtma 4+3+4+4 kîteyan e.

44 Bafî, 36/1

45 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=Sw2r8bSylrs> (25.12.2023)

46 Bafî, 17/1

47 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=ULEVEN8IbCU> (25.12.2023)

- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.⁴⁸

3.1.10. Kêşa 16 Kîteyî bi Rîtma (4+4+ 4+3) Kîte

Seyranê ji malê axa de rabe de rûne Seyranê (3+4+3+3+3) 16

Seyranê ji malê axa kotiyê mêra bi qurbanê⁴⁹

Tablo 12

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14	15	16
<i>Sey</i>	<i>ra</i>	<i>nê'j</i>	<i>ma</i>	<i>lê</i>	<i>a</i>	<i>xa</i>	<i>de</i>	<i>ra</i>	<i>be</i>	<i>de</i>	<i>rû</i>	<i>nê</i>	<i>sey</i>	<i>ra</i>	<i>nê</i>
<i>Sey</i>	<i>ra</i>	<i>nê'j</i>	<i>ma</i>	<i>lê</i>	<i>a</i>	<i>xa</i>	<i>ko</i>	<i>ti</i>	<i>yê</i>	<i>mê</i>	<i>ra</i>	<i>bi</i>	<i>qur</i>	<i>ba</i>	<i>nê</i>
Rawestana wateyî			Rawestana wateyî				Rawestana wateyî			Rawestana wateyî			Rawestana wateyî		

- Asta kêşeyê rast e: 16=16 kîte ye.

- Asta rîtmê: 4 rawestanên wateyî di her nîvedêrekê de hene.

- Kêşa 15 kîteyî bi rîtma 3+4+3+3+3 kîteyan e.

- Bilêvkirina li gorî kîteyê li ser înternetê heye.⁵⁰

3.2. Kêş li Gorî Piyên Dêr

3.2.1. Kêşa Saf

Ev kêş, ji dubarebûna yek cureya “pê” ava dibe. Anku pê di hejmara birgeyê de hemşêwe ne.⁵¹ Di nav stranên de bi çar awayan derdikeve pêş.

3.2.2. Sê Birgeya Saf

3+3+3+3=12, 3+3+3=9, 3+3=6

Tirba min çêkin lê (3+3) 6

Li binê vê darê⁵²

3.2.3. Çar Birgeya Saf

4+4+4+4=16, 4+4+4=12, 4+4=8

Şehmîranê Şehmîranê (4+4) 8

Mala bavê Şehmîranê⁵³

3.2.4. Pênc Birgeya Saf

5+5+5=15, 5+5=10, 5=5

Bejn û bala te ji tayka sosinê (5+5) 10

Bejn û bala te ji tayka sosinê⁵⁴

48 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=ruCfRVAEf2Q> (25.12.2023)

49 Bafî, 13/1

50 Ji bo guhdarîkirina stranê bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=3GChyyZ1hR4> (25.12.2023)

51 Ahmad Barzan Taher, Di Helbestên Kanî De Muzîk, *Zanîngehe Van Yüziüncü Yilê, Enstîtuya Zimanên Zindî*, Teza Lisansa Bilind, Van 2019 r. 65

52 Bafî, 30/8

53 Bafî, 16/ 1

54 Bafî, 16/ 2

3.3. Kêşa Têkel

Ev cure kêş, ji du piyan ava dibe. Carina jî ji sê çar piyan ava dibin. Piyeke wan carekê tê û ên din jî du car û sê car tên.⁵⁵ Di nav stranên de bi pênc awayan derdikevine pêş.

3.3.1. Piyeke Çar Birgeyî û Piyeke Sê Birgeyî

$$4+3=7$$

Kember ketî fistanê (4+3) 7

Kember ketî fistanê (4+3) 7

Kember ketî fistanê

Kember ketî fistanê⁵⁶

3.3.2. Du Piyên Çar Birgeyî û Piyeke Sê Birgeyî

$$4+4+3=11$$

Li ser serî qere poşî Meyremê 4+4+3=11

Li ser serî qere poşî zalimê

Torîne qotiya derman û melhemê⁵⁷

3.3.3. Sê Piyên Çar Birgeyî û Piyeke Sê Birgeyî

$$4+4+4+3=15$$

Wextê dîne xwe dixemlîne lê lê dîne dîna min (4+4+4+3)15

Wextê dîne xwe dixemlîne hawar gidye mala min ⁵⁸

3.3.4. Du Piyên Çar Birgeyî û Piyeke Pênc Birgeyî

$$4+4+5=13$$

Keçê gundê me Mehmed Beg çûne ser bîrê (wey) (4+4+5) 13

Zerê gundê me Têlî Beg çûne ser bîrê (wey)⁵⁹

3.3.5. Piyeke Pênc Birgeyî û Du Piyên Sê Birgeyî

$$5+3+3=11$$

Agirokê li nava deştê Meyremê (5+3+3) =11

Agirokê li nava deştê zalimê

Torîne qotiya derman û melhemê⁶⁰

3.4. Kêşa Dewrî

Ev kêş ji du piyên cuda yê rêz bi rêz pêk tê. Yek li pey a din dubare dibe. Mînaka ev cure kêşan, ji dubarebûna

55 Goran 'Ebdulla, *Dîwanî Goran*, Çapa 1em, Tehran 1384 r. 14

56 Bafî, 42/2

57 Bafî, 43/8

58 Bafî, 21/5

59 Bafî, 11/2

60 Bafî, 43/9

du piyên çarî û du piyên sêyi derdikevin.⁶¹ Ew jî weha ye: 4+3+4+3=14

Nîvê şevê lê bûm diz nêrgizê narê cuwanê (4+3+4+3) 14

*Nîvê şevê lê bûm diz sorgulê bêrîvanê*⁶²

Dîsa mîna keke din

Sarê ti sara min î mehrûmê ti sara min î (3+4+3+4) 14

*Sarê ti sara min î mehrûmê ti sara min î*⁶³

Tablo 13

Rêjeya Sedî	Hejmara Stranan	Cureya Kêşê	Rêza Stranan
%2.27	1	Şeş Kîteyî	30
%22.73	10	Hefî Kîteyî	5, 14, 19, 22, 24, 25, 27, 31, 42,44
%22.73	10	Heyşt Kîteyî	4,10, 12, 16, 20, 23,28, 29,34,39
%2.27	1	Neh Kîteyî	32
%11.36	5	Deh Kîteyî	6, 9, 15,38, 41
%11.36	5	Yazdeh Kîteyî	2, 3, 7, 37,43
%9.09	4	Sêzdeh Kîteyî	11, 18, 13, 40
%6.82	3	Çardeh Kîteyî	17, 26,36
%9.09	4	Pazdeh Kîteyî	1, 8, 21, 35
%2.27	1	Şazdeh Kîteyî	13

Ji xebata me kifşe dibe ku kêşa xwemalî di nav stranên dîlankî ya devera Botan de berbelav e û bi awayake tekûz di stranan de hatiye bi kar anîn. Ev zebat daye nîşan ku him di rîtm û strandina stranan de û him jî di parastina forma stranan de kêş çî qas roleke xwe yê girîng heye.

Encam

Edebiyata gelêrî ya Kurdî, ji aliyê helbestên folklorî ve gelek dewlemend e. Yek ji van helbestan jî stran e. Bi taybetî stranên dîlankî, bi kêş û pîvana xwe ji cureyên din hatine veqetandin û bûne cureyeke serbixwe. Kêş û pîvan, stranê dixwe weke helbestê û estetîka wê ya şî'rî temam dike. Wê ji zimanê asayî û rojane cuda dike. Herwiha kêş, ji bo rîtm û strandina helbesta folklorî dibe alîkar. Bi taybetî di helbesta dîlankî de roleke berbiçav digire. Û bi kêşa xwe ya bi rêk û pêk dikeve çokê reqqas û listikvanan. Di xebata me de jî li ser kêşa stranên dîlankî hatiye rawestîn û hatiye dîtîn ku stranên devera Botan bi kêşa xwemalî hatine vehonandin. Kêşa xwemalî, kêşa netewî ya gelê Kurd e. Bi salan ev kêş hatiye bikaranîn. Ji vê kêşê re kêşa birgeyî û penceyî jî gotine. Dema hejmara kîteyan deh be anku bi qasî hejmara tilîyên mirovî be, bi du rawestanan hatine vegotin; lê ku ji deh kîteyan zêdetir be, herî kêş bi sê rawestanan hatine vegotin.

Ji xebata me diyar e ku kêşa xwemalî, bi awayekê bi rêk û pêk di stranên dîlankî yên Kurmancî de xuya dike. Bi kêşê, me stranê di helbesta Kurdî ya gelêrî de ji cureyên din veqetand. Di pratîzekirina kêşên xwemalî de, me stranên dîlankî yên ku Mela Xelefê Bafî ji devera Botan tomakiribû bi kar anîn. Helbet ew destxet hatibûne nivîsîn, me wan yek bi yek latînzê kirin. Ji xeynî stranan, kilam, lawik, gotinên pêşyan, mamik û hin agahiyên derbarê deverê de jî hebûn. Ev keresteyên folklorî, îro li ser malpera înternetê a Ebdulreqîb Yûsîfî hene û ji bo îstifade û gihaniyê vekirî ne. Ji ber ku mijara me stran bû, me tenê stranan latînzê kir. Me 44 defteran vekola û ji wan defteran 44 stranên dîlankî tesbît kir. Di stranan de kêşên hêrî zêde hatine bikaranîn di honandina strana dîlankî ya folklorî devera Botan de, kêşa 7 û 8 kîteyî bû. (%22.73) Kêşên kêmtirîn, kêşa

61 Ahmad Barzan Taher, h.b., r. 66

62 Bafî, 36/3

63 Bafî, 26/1

6 û 16 birgeyî bûn. (%2.27) Li gorî hejmara piyan hersê cure kêş jî di stranên de berbelav in: Kêşa Saf, Kêşa Têkel û Kêşa Dewrî. Di stranên de kêşa zêdetir berbelav, kêşa têkel e.

Piştî van encaman em dikarin bêjin ku kêşa xwemalî, bi awayekê bi rêk û pêk di stranên dîlankî yê Kurmancî de xuya dîkin. Ev jî dide nîşan ku ev stran ku ji aliyê Mela Xelefê Bafî ve hatine tomarkirin jî aliyê rêz û kîteyên xwe ve hebûna xwe ya resen parastine. Û ji aliyê kêşê ve di nav sînorên standarda helbesta gelêrî û strana Kurdî ya gelêrî de ye.


Çavkanî

- Ahmad Barzan Taher, Di Helbestên Kanî De Muzîk, *Zanîngehe Van Yüzüncü Yilê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Teza Lîsansa Bilind*, Van 2019
- Bekr Mihemed, *Kêş û Rêtmî Şi'ri Folklorî Kurdî*, Weş. Aras, hej. 294, Hewlêr, 2004
- Besîr Kamil Hesên, *Mêjûy Rexnesazî*, Çapa 1. Weş. Taran, Silêmanî 2015
- Elî Dilşad, *Binyatî Helbest Le Honrawey Kurdî da*, Weş. Renc, Silêmanî 1998
- Gerdî Ezîz, *Kêşî Şîrî Klasîkî Kurdî*, Çapxaney Wezareti Roşnibîrî, Ç.1, Hewlîr 1999
- Gerdî Ezîz, *Kêşnasî Kurdî*, Dezgay Çap Pexşî Narîn, Hewlêr 2014
- Goran 'Ebdulla, *Dîwanî Goran*, çap 1, Tehran 1384
- Jahany Parviz, Çiftci Hasan, Beytên Kurdî: Memê Alan Wek Minak, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* Yıl: 6, Cilt: 6 Sayı: 11, 2020/1, ss. 9-34
- Kaplan Yaşar, Strana Kurdî (Kurmancî): Devera Hekarîyan Wekî Nimûne, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 1, Cilt 1, Sayı 2, Kasım 2015.
- Kovara Hawar, hej. 22 çap 2, weş. Belkî, Diyarbakır 2012
- Nihêlî Ni'metullah, *Şêwazgerî-Teorî û Praktik-*, Weş. Sipîrêz, Hewlêr 2007
- Qemerî Cewat, Kurtejiyana Xelef Remezanê Bafî, *Kovara Kelhaamed*, hej. 47 Zivistan 2020-21 r. 44-46
- Teha Dastan, Hemu 'Ebdullah, Kêş Di Strana Dilankî Ya Devera Behdînan da, *Kovara Poyêtîka*, Hej. 1 Payiz 2022
- Zengî, Dilawer, *Dîroka Kelepura Mîrnîşîniya Botan*, Beyrûd 2005 r. 12


Çavkaniyên Dîjîtal

- <https://abdulraqib.net/> (12.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=CeYeI5duQIU> (20.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=IwNLt8cJWGA> (20.12.2023)
- https://www.youtube.com/watch?v=sEarjTH_mHo (20.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=mPL1sDuhjE> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=OmGX8KPlvWY> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=rhrHaodEOHg> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=yu2WV-UavZM> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=Sw2r8bSylrs> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=ULEVEN8IbCU> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=ruCfRVAEf2Q> (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/watch?v=3GChyyZ1hR4> (25.12.2023)
- https://www.youtube.com/watch?v=oZ_alCuIX4k (25.12.2023)
- <https://www.youtube.com/@abdulraqibiosuf4957> (10.01.2024)


Pêvek



Pêvek 1: Naveroka Destxeta 32an



Pêvek 2: Destpêka Destxeta 32an



Pêvek 3: Strana Serê Zavano ji Destxeta 32an



Pêvek 4: Weneyekê Mela Xelefê Bafî

Çend Stranên jî Destxetê bi Nivîsa Latînî

Strana Zirav

Hay zirav e zirav e zirav e

Daykêw têla teşyê zirav e

Hay zirav e zirav e zirav e

Daykêw têla teşyê zirav e

Min diristo te digo xav e

Daykêw têla teşyê zirav e

Teşiya min ji darê merxê

Daykêw têla teşyê zirav e

Lê dirêsim biska û berxê

Daykêw têla teşyê zirav e

Teşiya min ji darêw bîyê

Daykêw têla teşyê zirav e

Lê dirêsim biskaw mîyê

Daykêw têla teşyê zirav e

Teşiya min ji dar hinarê

Daykêw têla teşyê zirav e

Lê dirêsim biskaw karê

Daykêw têla teşyê zirav e⁶⁴

Strana Ez Xelef im

Ez xelef im xelef im hawara mîr hawara mîr

Ez xelef im xelef im 'Ezdînşêr hakimê Botan e.

Xweyê şûrê bi sedef im hawara mîr hawara mîr

Xweyê şûrê bi sedef im 'Ezdînşêr hakimê Botan e

64 Bafî, helbesta 20em.

*Ji 'eşîra bi keyf im hawara mîr hawara mîr
Ji 'eşîra bi keyf im 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Ez xelefê şovî me hawara mîr hawara mîr
Ez xelefê şovî me 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Xweyê şûrê misrî me hawara mîr hawara mîr
Xweyê şûrê misrî me 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Ji 'eşîra bi hîvî me hawara mîr hawara mîr
Ji 'eşîra bi hîvî me 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Ez xelefê kinik im hawara mîr hawara mîr
Ez xelefê kinik im 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Xweyê şûrê bi şîrk im hawara mîr hawara mîr
Xweyê şûrê bi şîrk im 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Ji 'eşîra hindik im hawara mîr hawara mîr
Ji 'eşîra hindik im 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Hewrexê xweş hewrexê hawara mîr hawara mîr
Hewrexê xweş hewrexê 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*'Esker herkî ser şaxê hawara mîr hawara mîr
'Esker herkî Şernexê 'Ezdînşêr hakimê Botan e*

*Me şer e li ser Herzexê hawara mîr hawara mîr
Me şer e li ser Herzexê 'Ezdînşêr hakimê Botan e⁶⁵*

65 Bafî, helbesta 8em.